

Nûh li ser KORONA

KURMANJI
JMAR 5
GULAN 2020

Millet di bin barek giran da ye

**Wênayên nuha nîşan dide ku hemo
millet bi krîza korona ve bandor
bune.**

Her hefte, Desteya Rêveberiyê agahdarî ji şaredariyan kom dikin. Desteya Rêveberiyê dûv re wênayek vedigire ku ka rewş li wîlayeta Kalmar çawa xuya dike. Gava ku hûn hemî agahdariyan bi hev ra kom bikin, em dikarin fêhm bikin ku millet çawa bandor buye û Em dikarin fêhm bikin ku çawa yê berpirsiyar kar dikin ji bo rewş baştir bikin.

Vê heftê, wênaya nuha nîşan dide ku hema her perçeyek ji millet, ji hêla krîza Korona ve bandor bune.

Pir kes li malê xwe ne ji ber ku ew nexweş in, yan jî ji ber ku zarok nexweş in. Gelek kes jî hewceyê alîkariya pere ne, ji ber nikarin biçin kar.

Pir zehmete ji şîrkete ra dema ku kes tiştan an karûbarên wan naxwaze. Heger mirov nikarê karê xwe biparêze û heger şîrket

herin îflasê , wê demê xem û pirsgirêk yê pir bibin.

Şaredariyan jî ditirsin ku pirsgirêk hebin heger zarok li mal bimînin û neçin dibistanê. Ji aliyekî din ve zarok ne aram in li malan. Hûn dizanin ku mirov karên xwe winda bike û neçar bimîne li mal bimîne lêxistin û alkol zêde dibe. Di rewşên normal de, mamoste dibînin ku zarok baş derbas dibin, lê zor e ku dê û bav zarokên xwe li malê bimînin. Heger hûn dizanin ku zarok têne tacîz kirin an ji wan re xwarin nehatiye dayîn, divê hûn wê rapor bikin da ku malbat alîkar bibin.

Pir xem hene ku ciwan têkilî bi narkotîkê û karên ne baş kevin. Xeter mezintir e dema ku ew neçin dibistanê.

Şaredariyan, Desteya Kargêriya wîlayetê, Herêm û hemî rayedarên din yê wîlayetê hevûdu agahdar dikin û dibin alîkar. Divê her kes jî arîkar bike. Hûn vê yekê li dû şîreta Desteya Tenduristiya Gel dikin

**Destên xwe bişon * Ji hev dûr kevin *
Rêwîtiyê nekin**



Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkarîyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêveberiyê wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de hene.



facebook.com/krissamverkan.kalmar

Kalmar kommun

